“Kesê ku hez nake XWEDÊ nas nake. Ji ber ku XWEDÊ hezkirin e. XWEDÊ, bona ku em bi navgîniya MESÎH’ê yekane bijîn, Wî şand dinê, bi vî awayî ji me hezkirina xwe nîşan da. Me ji XWEDÊ hez nekiribûn, lê belê Wî ji me hez kirin û ÎSA MESÎH, mîna qurbana ku gunehên me bide bex-şandin şand dinê. A vay hezkirin ev e!”

“Ma hûnê çawa ji cezaya dojehê birevin?”

“Wê gavê bona ku gunehên we bête paqijkirin tobe bikin û vegerin XWEDÊ!”

Hûn dikarin pirsên xwe ji vê navnîşanê re bişînin:
Hoffnung und Leben e.V.
Postfach 10 13 82
33513 Bielefeld
Germany

Kurdisch (Lasst euch versöhnen mit Gott)

KITÊBA PÎROZ WUSA DIBÊJE:

BI XWEDÊ RE AŞTIYÊ BIKIN!

“Tuyê XWEDAYÊ xwe XUDAN bi hemî dilê xwe, bi hemî canê xwe û bi henî aqlê xwe hez bike. Tuyê ji cîranê xwe mîna xwe hez bike.”

“Kesekî rast nîne, tenê kesek jî nîne. Kesî ku têbighîne nîne.Kesî ku li XWEDÊ digere nîne. Hemî ji rê şaş bûn, hemî bêkêr bûn. Yê ku qenciyê dike nîne, tenê kesek jî nîne! **Tirsa XWEDÊ di wan de nîne.”**

“Ger em bibêjin gunehên me nîne, **em dê xwe bixapînin** û dê di hundirê me de rastî tunebe.”

“Guneh bi navgîniya mirovekî, mirin jî bi navgîniya mirovekî kete dinê. Bi vî awayî mirin bi hemî mirovan ve belav bû. **Ji ber ku hemiyan guneh kirin**.”

“Çawa ku carekê mirin paşê jî darazbûyîn qedera mirovan be, MESÎH jî bona gunehên gelekan hilgirê carekê hate qurban kirin. Cara duyem ne bona gunehan hilgirê, lê bona xelasiyê bîne dê ji yên ku li benda Wî ne re xuya bibe.”

“XWEDÊ jî **ji me hezkirina xwe bi vê yekê dipeyitîne**: Em hê gunehkar bûn MESÎH bona me mir.”

“XWEDÊ MESÎH, wekî qurbanekî bi xwîna xwe gunehan dide bexşandin û bi baweriyê ve tête pejirandin pêşkêş kir. Bi vî awayî dadiya xwe nîşan da.”

“Wekî din di kesekî de xelasî nîne. Di bin vî ezmanî de **navek wekî din nîne ku li mirovan hatiye bexşandin û me xelas bike!**”

“ÎSA MESÎH: Rê, rastî û jiyan ez im got. Ger navgîniya min nebe, tu kes nikare were buhuştê!”

ÎSA MESÎH wisa dibêje: **“Ez ya rast ji we ra bibêjim, jiyana bêdawîn ya kesê ku Gotina min bibihîze û baweriyê bi yê ku min şandiye re bîne heye. Yê wisa nayê darazkirin, ji mirinê derbasî jiyanê bûye.”**

“Lê belê ger em li gunehên xwe mukur bêne, dê XWEDA yê ewlekar û bidad e li gunehên me bibexşîne û me ji her xerabiyê ve pak bike.”

“Bi vî awayî XWEDÊ mîna ku bi navgîniya me bangê bike, em li ser navê MESÎH şandîtiyê dikin û bi navê Wî lava dikin: Bi XWEDÊ re aştiyê bikin! Ji ber ku XWEDÊ MESÎH’ê ku gunehnezan bona me kir pêşkêşiya gunehê. Wisa ku em bi xêra MESÎH bibin rastiya XWEDÊ.”